



## Kargerên STARTTS kî ne?

Kargerên STARTTS pisporên perwerdekirî yên ji çandên cûda tên holê ne û di alîkariya mirovên ku di paşerojê de tiştên dijwar dijîne de pispor in.

## Wextê ki mirovek tercîh dike ki ji Îngilîzî bi zimanek din biaxive wê gave çî dibe?

Wek zimanê Erebi, Darî, Farsi, Hazarî û Tamîlî kargerên STARTTS bi gelek zimanan diaxivin û dema ku pêwîst dibe wergêrên pispor kar tînin.

## Gelo agahdariya kesê dê bê nepenî girtin?

Xizmetên STARTTS'ê hemû nepenî ye. Heke mirovan cewaz bidin û ew alîkariya wan bike STARTTS bi tenê wisa dê agahiyên kesek parve bikin. Lêbelê heke ku mirov ji me re bibêje dibe ku ewan xwe an jî yên din biêşînin, wê hingê kargerên STARTTS hewce dikin tiştêkî bikin ji ber ku wê kesê an yên din biparêzin.

## Der barê STARTTS`ê

STARTTS rêxistinek pispor, bê-sûde a ku ji bo alîkariya xelk û civakan bike da ku birînên îşkenceyê û trawmaya penaberan derman bike û jiyana wana li Avusturalya ji nû ve ava bike ji 30 salan zêdetir e tedawî û piştgiriya psîkolojîk a çandî têkildarî û navbeynvanîyên civakê dabîn dike. Bi peydakirina perwerdehiya ji bo xizmetan, parêzvanî û xebata siyasetê re STARTTS di heman demê de hawirdorek başbûnek erênî peyda dike.

[www.startts.org.au](http://www.startts.org.au)

## 📞 📧 Têkilî bî me re bikin

### HEAD OFFICE CARRAMAR

152-168 The Horsley Drive  
Carramar NSW 2163  
(02) 9646 6700 (Reception) | (02) 9646 6800 (Referrals)

### OTHER OFFICE LOCATIONS

Albury	Armidale	Auburn
Blacktown	Coffs Harbour	Fairfield
Liverpool	Newcastle	Wagga Wagga
Wollongong		

Go to [www.startts.org.au/contact/](http://www.startts.org.au/contact/) for office location details.

STARTTS also provides counselling and other types of services at outreach locations in Sydney and across NSW such as Bankstown, Parramatta, Dee Why, Lakemba, Penrith, Campbelltown, Rockdale, Tamworth and Griffith. These locations change according to the needs of our clients. Please contact STARTTS for further information.

Images: © STARTTS/David Maurice Smith and Yousif Aziz

Kurmanji



Agahî jo bo

## Kirryaran



Ji bo Tedawî û Rehabîltasyona Mexdûrên Îşkence û Trawma Xizmeta NSW (STARTTS)



## STARTTS ji bo kî ye?

STARTTS, bi mirovên ku berê hatina li Awustralyayê zordarî, şer, tundî anjî bînpêkirina mafên mirovan tecrûbe kirine û ji ber vê sedemê li rastî dijiwarîyan tîn re dixebite. Çi wextê û çi mercan de ew hatibin li Awustralyayê jî STARTTS dikare alîkariya mirovan bike.

## Gelo çima kesek hewceyê alîkariya STARTTS`ê ye?

Mijûlbûna li bûyîna welateke nû, mijûlbûna bîranînên tîrsnak ên paşerojê carinan dikare bibe tiştek fetisok û mirovan bixem û şepirze bihêle. Ev dikare tenduristiya wan û jîyana rojaneya wan bandor bike. Hin berpeyyên gelemper wedihevin:

- Dijwariyên fêrbûna Ingilîzî
- Pirsgirêkên raketinê û xewnên xirab
- Bîranînên paşerojê yên ku berdewam dikin
- Êşên serî û laşê
- Sotbûn anjî tirsandina hêsan
- Hêskirina bêhevî anjî bêgav
- Hêsta dest çûyina jiyana rojane
- Tingijîna li nav malbatê
- Dijwarî ditîna bawerî ji mirovan anîn an jî xwe lê girtina hevalên nû, hêstkirina tenêti.

## STARTTS çawa dê alîkarî bike?

STARTTS di piştgiriya mirovên ku serpêhatiyên rewşên dijwarê ku di paşerojê de derketine hole de pîspor e da ku jîyanekî berhemdartir pêşniyaz û baş bike. Gava mirovan hindiktir zordarî û pirtir zepkirin hest dike, fêrbûna Ingilîzî, destpêkirina karekî, bi malbar re aramîbûn û xwe li hevalên nû ve girtin hêsantir dibe.



## STARTTS çawa bikaribe alîkarî bike?

Rahênêrên STARTTS`ê dikare bi mirova ku xof û xem pê re ye biaxive. Ew dikarin di derbarê xof û dijwariyên ku ev rû bi rû ne de biaxivin, li wana bi mirovên û rêxistinên ku ji bo pirsgirêkên wan ji wan re alîkarî bibin re ragîhinin hev û alîkarî bibin ku ew kesa fehm bike ku Awustralya çawa dimeşe.

## Heke kesek bixwaze ku bibe beşdarê komek

Ji bo mirovên ku piştgiriya koman ji şewirên kesane çêtir dibînin, STARTTS xwediye gelek komên bi zimanên ciyawaz e. Kom bi tenê tîn damezrandin heke STARTTS mirovên têkildar wek têra xwe tine cem hev. Kom Malbatên li nav Guhartina Çandî, komên şewirandin, komên palpiştiya civakî, komên werzişê, komên hûnerê û qampên ciwanîyê wedihevine.

## Ragêhîna li STARTTS

STARTTS ragêhînen ji her jêderkê ya kesane jî di nav de dipejirîne. Ji bo pêkanîna ragêhîna STARTTS:



**Bigerin (02) 9646 6800**  
(xeta hundirîn bipirse)



**Epeyam STTS-IntakeGeneral@health.nsw.gov.au**  
(form li ser malpera STARTTS heyê)

## Kesek çî qas li bendê dimîne?

STARTTS xwediye listeyek bendewariyê ye, lewra dibe ku kesek heta rahêner li wan ji bo jîvanê bigere di navbera 2 û 4 hefteyî dê bendê bibe.

## Gelo kesek dikare bê jîvan serî lê bixe?

Ji bo ragêhîna xwe yê li STARTTS`ê, kesek dikare serî lê bixe, lê ji bo beşdarbûna danîştina şewirandinê divê ew jivanek pêk bînin.

## Nirxa STARTTS çî qas e?

Hemû xizmetên STARTTS ji bo mirovên ku em alîkarî dibin bê dirav e.

## Mirov çend salî pêdivî ye ku bibe?

Ji zarokên pir piçûk bigire heya mirovên mezintir STARTTS li mirovên ji hemû temenî re alîkariya dike. Heke kesek 16 salî û binî de be STARTTS dê hewceyê razîbûna dê û bavê an jî parêzvanê wan be.

## Divê ku mirov here li ku?

STARTTS mirovan li Sydney û cihên heremî ya NSW de dibîne:

- Nivîsgehên STARTTS
- Cihên dorhêl ya STARTTS wekî navendên tenduristiya ciwakê û TAFE yan
- Dibistanan (ji bo xwendekarên li vî dibistanê de).